# Tekiya muhtacan-û guhlêdangeha dilovan- û xizmetên tên pêşêşkirinê

*Agahî bo penaberan li Eyaleta Bayern*



Kurdisch

Ethno-
Medizinisches
Zentrum e.V.

gefördert durch
Bayerisches Staatsministerium für
Gesundheit und Pflege

## Impressum

Die Hospiz- und Palliativversorgung – Angebote und Vorsorge. Informationen für Migrantinnen und Migranten in Bayern

**Herausgeber**
Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.
Königstr. 6, 30175 Hannover

**Redaktion**
David Brinkmann, Elena Kromm-Kostjuk, Ramazan Salman

**Übersetzung**
Dolmetscherdienst Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.

**Förderer**
Bayerisches Staatsministerium für Gesundheit und Pflege

**Layout & Satz**
Bernd Neubauer, Göttingen
Eindruck, Hannover

**Druck**
Unidruck, Hannover

Stand: April 2016 (1. Auflage)

Erhältlich in den Sprachen:
Arabisch, Bulgarisch, Deutsch, Englisch, Kurdisch (Kurmanci), Polnisch, Rumänisch, Russisch, Serbokroatisch und Türkisch.

Ev Rênîşander di nav projektê „Kampaniya agahiyan ya Bayern bo Tekiya muhtacan-û guhlêdangeha dilo-van- û xizmet ên tên pêşêşkirinê. Agahî ji bo penabe-ran“ li Bayern.

# Tekiya muhtacan-û guhlêdangeha dilovan- û xizmetên tên pêşêşkirinê

## Di vê Rênîşanderê de hun bersiva van pirsan dibînin:

- Tekiya muhtacan- û guhlêdgeha dilovan çi ye?
- Çi xizmet li Bayern tên pêşkêşkirin û çi karî dikin?
- Çi mesref li ser Sîgorta dikevin?
- Mafê min wek nexweş çi heye û kî dikare biryarê li şûna min werbigire, eger ez bi xwe nema bikaribim?
- Qewêtînameya nivîskî çi ye („Patienten-verfügung“)?
- Tewkîlname xizmetê çi ye („Vorsorgevoll-macht“)?
- Lênerîna berdest çi ye („Betreuungsver-fügung”)?
- Çawa dikarim xatirxwestinê bixwazim, şînê û veşartinê bikim? Pêdiviye hay ji çi hebim?

## Tekiya muhtacan-û guhlêdangeha dilovan çi ne?

Mirin, koçkirin û xatirxwestin di jiyana her mirovekî de heye. Eger dawî li jiyanê bi sedemekê ji sedeman diyar bibe, nîşana nexweşiyeke giran rû bide, dikare metirsa ji azariyê, cefayê û bitinêbûnê çêbike. Endam ên malbatê û hogir ên yê nexweş cefayê pê re dikişînin, hest dikin, nikarin tiştekî bikin, zêdeyî taqeta wan e û rûbirû di gel rewşê bitinê mane. Di vê pergalê de, saziyên pispor di biwarê Tekiya muhtacan- û guhlêdangeha dilovan de wê valabûnê dadigirin.

Tekiya muhtacan-û guhlêdangeha dilovan kar û xizmet ên saziyên cuda cuda bi xwe ve digire, xizmetkar û mirov ên ji bo piştgiriya nesax ên zor û yên li ber mirinê, ko di qona-xa jiyanê ya dawî de ne û malbatên wan di-kin. Wê wek erk tav ser şanê xwe, ko alîkariya têkildaran û xwedan û malbat ên wan bikin û wan derman bikin, lênerînê bikin, li kêleka wan rûnin, bo metirsiyan kêm bikin û nex-weşiyan li ser ya têkildar sivik bikin. Di gel wan şêweyên demankirinê-û alîkariyên têne pêşkêşkirinê yên gelekreng dixwaze qalîte û asteya jiyanê ji yên li ber mirinê û malbat ên wan wek xwe bi kêmanî bihêle, an jî baştir

bike û hatina dawiya jiyanê bi şêweyekî sivik-tir bête wergirtin. Ev kar têtê pêşkêşkirin, ji gelek hêlan e wek xizmetguzariya guh lêdana dilovan î nojdarî û bijîjkî û parçeyê mezin ji xwebexş ên karê tekiyê dikin.

Ew van bi xwe ve digire:

- Dermankirina nojdarî (b.n. serederiya destnîşankirî ya êş û kêmkirina wê û hinek giliyên din mîna henaseçikîn, kêşeyên nekarîn û cûtina xwarinê uhd) ji azaran kêm dikin.
- Şêwirdan bo nimûne, pirs ên yasayî
- Lênêrîn /Digelbûn û birin/lênerînên can
- Guhpêdan û barsivkirin li nik yê guhpêder
- Alîkarî û pêreçûna nik karmend ên fermî



Tekiya muhtacan-û guhlêdangeha dilovan berê xwe dide mirov ên li Bayern dijî, bila ji kîjan deverê jî hatibin an jî ola wan çi be. Karê wan ew e, ko hinek ji daxwazên mirov ên li ber mirinê û yên gelekî nesax bicih bînin:

- Ne bitenê bo mirinê, belê ji malbatê û mirov ên din ên nêzîkî wan û li derûdora wan bin.
- Li gor derfet hebe, jiyaneke xweş bê azar û êş ên zor, jiyanê bike
- Li malê, an jî li devereke cihê baweriyê be bo wî bimîne.
- Dem hebe, tişt ên dawî rêk bixe, têkiliyan zelal û diyar bike û bikaribe xatirê xwe bixwaze
- Danûstendinê li ser babetên giring, yên bi jiyan û mirinê ve girêdayî bike û agahiyan bide û bistîne, b. n. pirsa wateya jiyanê an jî li dora wê, ka piştî mirinê çi diqewime

## Çi xizmet li Bayern têne pêşniyarkirin û encam çi ne?

Tekiya muhtacan-û guhlêdangeha dilovan li Bayern gelek pêşniyarên hemereng hene. Di wî karî de, pispor ên ji beş ên ciyawaz bi hev re kar dikin wek b.n. bijîjk, karkerên xizmetê, perwerdekar ên civakî, derûnas, alîkarên giyanî, terapiya pîşeyî û t.b.d.-piştigirî di rêka karmend ên xwebexş re, hevalê perwerdekirî di gel yê muhtac (li rupela 6 binêre).

Çi reng ji xizmetê sûdmendtir e û yê têkildar û xizm ên wî pêdivî çi alîkariyê ne, bi her pergalekê ve girêdayî ye. Pirsiyarê ji bijîjkê xwe yê malê bike, an jî li devera hun lê komele ya rêxistin ên muhtacan hebin, şîretan werbigirin. Sîgortayên nexweşiyê jî dikain wan xizmet ên bo Tekiya muhtacan-û guhlêdangeha dilovan şêwirmend û alîkar bin.

Xizmet jî li gor pêdivî û derfetan di nexweşxanê de an jî bi seredana vekirî re encam bide.

### Xizmeta (Tedawî) vekirî

Gelek mirov ên bi nexweşiyên, ko sax nabin ta dawiya jiyana xwe jî li mal, di derûdoreke pêbawer de û nêzîkî malbat û heval û hogir ên xwe guh bi wan bête dan û bêne dermankirin. Ew demankirina li Tekiya muhtacan-û guhlêdangeha dilovan dikare bête peydakirin û şêwrê pêşkêş bike, digelbûn, û xizmet ên nojdarî û guhpêdanê li malê (an li saziyên guhpêdanê jî) kirin.



Di rewş ên normal de, ev şêwe ji xizmetê bi rêka rêmayên xizmetê, wate di rêka bijîjkê malê, bijîk ên pispor, karmend ên guhpêdanê û hin din tên. Ev şêwe ji xizmet ên bingihîn bi tevayî jê re tê gotin *Guhlêdangeha dilovan ya giştî li iyadeyên derve* (AAPV). Ew parçeyeke ji xizmeta bingehîn ya tendurustiyê ye û pêk têt çaxê berdewam demeke dirêj bo biserdebirina xizmetê, ji mirovê ko digihe dawiya jiyana xwe.

Carnan, rêjeya wê xizmeta têtê pêşkêşkirin têrê nake û dibe, ko pêdivî be, guhpêdaneke

## Xwebexş ê di gel muhtacan („Hospiz-begleiter“) wate xizmeta muhtacan li iyadiyên vekirî

*Yê di gel muhtacî xwebexş in, alîkerê fêrbûyî ne, yên di beş ên cuda yên Muhtac- û guhlêdangeha dilovan dikarin bêne erkdarkirin. Ew têne, malê, nik yê têkildar, lê wê bibin nexweş ên hundurîn, di mal ên bêkêran de (li Rûpelê 7 binêre), saziya xizmetkarên hundurîn, klînîkan û h.d wê kar bikin. Yên digel muhtacan in, rênas ên pêbawer in û alîkariya mirov ên gelek nexweş û yên li ber mirinê û malbat ên wan di gelek xalan de, li dawiya jiyana wan, dikin. Wisa dikare di kar ên biçûk de xizmêtê bike, pêşiya wî bixwêne, hevalekî axêverî baş e, di gel diçe nik bijîjkan an jî nik karmend ên fermî an jî „tenê li wir be“.*

zor ya nojdarî bo bête kirinê. Ev dikare pêk bihêt, dema nexweşînê, lê cor bibe, û azar û êş corbicor bibin, ko êdî guhpêdaneke berdewam şev û roj pêdivî be. Li vir taximekî taybet yê xizmetê heye, ko ji bo vî erkî bixwe hatibe fêrkirin. Di vî taximî de, mirov ên kar û beş ên cihêreng têne nik hev: Bijîk (bijîk ên pispor bi xwendineke taybet di biwarê nojdariyê ji bo wan yên li ber mirinê ne. „Nojdariya guhlêdangehê“), karmend ên xizmetê, karmend ên civakî û herweha gelek ên dinê, yên perwerdeyeke, fêrbûnek zêditir wergirtine. Ev reng ji alîkariyê wek Guhlêdangeha dilovanî taybetmend ya li eyadeyên vekirî (SAPV). Eve divêt, ko di rêka bijîjkekî re bête rêkxistin.

Xwebexş ên di gel muhtacan dikarin wek hêzeke temamker ji bo rehetbûn û digelçûnê bêne erkdan (li sebeta agahiyan binêre)

### Xizmeta di Nexweşxanê de

Eger guhlêdan li mal, ji ber sedem ên jiyawaz nemumkin be (gelektir), ew mirov ê nexweşû li ber mirinê dikare bête birin, bo saziyekê ya tekiya muhtacan- û guhlêdangeha dilovan, ko tê de bimîne û xizmeta wî bête kirin. Ew cih ji wan re tê gotin istegeh ên guhlêdangehê wate xizmet ên guhlêdgeh ên nojdariyê di nexweşxaneyan de an jî lê istegehên bêkêran (an jî „Tekiya muhtacan“ ji wan re dibêjin)

### Xizmeta dilovanî li nexweşxanê

Gelek nexweşxane li Bayern di vê demê de, istegehên guhlêdangeh ên xwe yên dilovan hene an jî ya ji wan re tê gotin xizmeta nojdarî peyda dikin. Ji bo vê xizmetkariyê pisporan

bo alîkariya mirov ên gelekî nexweş û li ber mirinê û xizm ên wan fêr û perwerde dibin. Ew xizmetguzarî bi giştî li nexweşxanê heye nedirêjxayen e, belê li dûv armanc ên xwe diçe, rewşa yê nexweş lê başir bike, ko bikaribe nêzîk vegere malê, li xanegeheke bêkêran bicih bibe an jî ji saziyeke hundurîn bête derxistin.



## Tekiya muhtacan ya hundurîn

Nexweş ên giran, mirov ên li ber mirinê dikarin têkvin nav tekiya muhtacan ya hundurîn bibin, dema xizmet li malê nemumkin be û mana li nexweşxanê nepêdivî be. Normal, xizmetguzarî li yekode de dibe.. Ev hawîr li tekiyê „malbat1i“ ye û pêdivî ye yê nexweş li gor bikaribe hindekî hest bike, ko wek malê ye û ne nexweşxane ye. „Malbatî“ wate jî, ko malbata yê li ber mirinê, li gor daxwazê, di biwarê guhlêdan, çavdêrî û dermankirinê, dikaribin beşdariyê di birayrê de bikin. Ew xizmetguzarî li gor pêdiviyê di rêka bijîjkê malê an jî bijîkê ji-taxim ê SAPV, karmendên çavdêrîya tendurustiyê û yên xizmeta xwebexş di tekiya muhtacan de dikin. Ew derfet heye, ko terapiyên bêhtir mîna mûzîkê-, huner- an jî terapiya bi pîşe û kar bike.

Rêjeya zêde yê ji tekiyên yên li ber mirinê tê de dimînin, derfetê didin, ko joreke taybet ji bo xatirxwestinê birêk bixin. Li wê jorê dikare bi bihinferehî û aramî daxwazê, li gor bîrûbaweriyên olî yên mirovê li ber mirinê û malbata wî jî mirin- û tîtal ên wê, çawaniya rêveçûnê, bête gengeşekirin. (Rûpel 11, binêre)

## Tekiya muhtacan-û guhlêdangeha dilovan bo zarok û gencan

Mixabin, carnan zarok û genc jî bi van nexweşiyên giran wisa dikevin, ko gelekî dixuyê ew rûbirûbûna jiyaneke kurt dibin û zor pêdivî ye, serederî û dermankirina nojdariya guhlêdangeha dilovan di gel wan bête kirin. Xizmetdayîna wan, li ser karmend ên

**Çi mesrefa dikeve ser şanê yê garantîker?**

*Ji bo xizmetkirina Tekiya muhtacan-û guhlêdana dilovan pêdivî nîne li Elmaniya ko tu para mesrefê bidî. Eger hat û bijîjk bikaribe destnîşan bike, ko pêdivî bi guhlêdangeheke dilovan ya Taybet î derveyî (SAPV) heye, sîgorta nexweşyê li gor rêziknameyê bijîjkiyê wê wê mesrefê wê xizmetê jî bi xwe bigire. Zêdebarî wê jî mafê yên sîgortekirî beramber sîgorta nexweşiyê heye, wek taqekes, bêpere şêwirmendiyeke taybet î indîvîduell û alîkarî ji bo xizmet ê di Tekiya muhtacan- û guhlêdangeha dilovan de werbigire.*

xizmetê zehmetiyeke çêdike. Zorbeyî caran, xizmet û tedawîkirina wan bi salan dom dike. Xizmetguzariya li mala wan û di nav malbat ên wan de roleke giring e dilîze.

Ji ber vê sedemê jî ji bo wan xizmet ên biwanbend pêşkêş dibin/- sazî an jî mirov ên xwedan fêrbûn ên taybet: Digelker ê tekiya muhtacan, tekiya iyadeyên zarokan yên mayînê an iyadeyên taybet yê derve bo taximekî nojdariya liberdilçûnê *(pispor di biwarê iyadeyên derve ya guhlêdangeha dilovan bo zarok û gencan*. Bi kurtahî: SAPVKJ). Wê di klînîkuma zanîngeha Münschen de sala 2016an guhlêdangeha dilovan ya zarokan vebe.

## Çi mafên min weke nexweşekî heye û kî dikare biryar ên giring ji dêvla min ve bide, dema ez bi xwe nema karibim?

Di prensîpê de, ew hemî biryar ên bi tendurustiyê ve berbend in herdem daxwaza yê nexweş ya biryardar e. Taxim ê bijîjkiyê giring e vî tiştî di her dema dermakirinê de li ber çavan bigire û li gor birayr ên yê nexweş serderiyê bike û tev bigere. Ev tê wê wateyê, ko li Elmaniya yên bijîjk netenê erkdar in, wan nexweş ên xwe sax bikin, xem ên wan tişta pê çêbibe kêm bikin, lêbelê her weha jî li dûv pirsiyarê bikin, ka gelo, ev yê nexweş li wê radeyê ye bikaribe wate û encam ên nojdariya dermakirinê têbigihe û biryara xwe ya li dijî wî şêweyî bide.

Ji ber wan sedem ên kêmasî û pirsgirêk ên netêgehiştina zimanî, dikare yekî wergervan bête erkdarkirinê.

Ev bo dermankirina di çarçoveya xizmeta nojdariya guhlêdangeha dilovan de dibe, li ser wê, dema ew biryarwergirtin di gel an jî li dijî tevdîr ên jiyaneke demdirêj tê.

Ji ber nexweşyeke zor, rûdanek an jî kemûkuriyeke dikare bibe sedema tengkirina erk ên laş û an/ derûnî, lê dibe jî weha be, ko biryar ên giring bo nimûne wek nimûne, êdî di derbarê dermankirina heyî de, ne bixweberî biryarên serbixwe û hindek tevdîr ên din têne wergirtin, êdî rewşa jiyana wî mirovê nexweş nema dibe ji erk ên wî û dikare bo wî neyête spartin. Mirov nikarê li Elmaniya biryarê li şûna mirovekî din werbigire, tenê, ji ber ew mirov bo nimûne, xizm û kesûkarê wî ye (awarte: dêûbav ji bo zarok ên xwe yên hîn sal ên xwe tije nebûne).

Ji ber wê yekê, li gorana dermankirin û nojdariyê, wê baştir bibe, eger temênî û qewêtiyên xwe berwext derbibirin (ne li wê dema, ko nexweş bikevin!) an jî destnîşan bikin, ew kî ye yê biryar ên giring bo wî bikaribin werbigirin. Di vê rewşê de derfetên curbicur yê nişteşîniyê hene.

## Qewêtînameya nivîskî („Patienten-verfügung“) çi ye?

Di vê belgeyê de mirov dikare bi nivîskî biçespîne, ka di van rewşan de, serederî divêt çawa bi rê ve biçe, di vê rewşa yê nexweş nema dikare bixwe hêvî û daxwaz ên xwe bîne zimên û nikare çu biryaran werbigire. Li vir mirov dikare berwext biryarê bide, ka çi tevdîr ên nojdarî, di rewşa nexweşiyeke giran û tirsnak de, dikarin bêne wergirtin û kîjan na. Li vir jî divê rê li ber mafê çarenûsî nayête girtin û ew maf bête parastinê.

Dako ew qewêtînameya yasayî be, zor giring e, ko ew bi nivîskî bête biserhevdeanîn, ji ber daxuyaniyeke devkî têrê nake, dako bibe belgeyeke fermî, yasayî! Loma gelekî giring e, bête diyarkirin, ka di çi rewşê de, çi tevdîr ên nojdariyê nayêne pejirandin û an jî çi reng ji dermankirinê bibaşî têne hêvîkirin.

Ji ber ko rewşa yasayî di warê nojdariya dermankirinê de, gelekî aloz in û carnan nikarin bêne têgehiştin, lew ra pêdivî ye, mirov berwext şêwirekê bo xwe werbigire. Bo nimûne mirov dikare pirsê ji bijîjkê xwe yê malê bike. Şêwirmendî di rêya saziyên xêrxwaziyê de an jî navend ên kilîta xerîdaran de („Verbraucherzentralen“) dibe. Hinek ji rêkxistin ên tekiya muhtacan şêwirê bêpere dikin.

Di dema dermankirinê de hemî yên têkildar bi Qewêtînameyê ve yasayî pabend in. lê ew qewêtîname dikare her dem bête gu-



hertin û (bi devkî) vegerandin. Ji bo alîkariyê formularên nimûne bêpere, indîvîduel yên guncayî hene.

## Tewkîlnameya xizmetê („Vorsorgevollmacht“) çi ye?

Her mirovek li Elmaniya derfet û maf bo wî heye, di çarçoveya, ya jê re tê gotin tewkîldan bo mirovekî din, mirovekî destnîşan bike û wî mafî bidiyê, ko bo beşekî an jî gelek beş ên jiyanê (bo nimûne daxwaz ên wî yên yasayî, mewdanî an jî biwarê nojdarî) û tişta bi wan pergalan ve girêdayî, guh bidiyê û biryarên giring werbigire, dema ew mirov bixwe nema di radeya biryarwergirtinê de be. Ew dikare bo nimûne biryara girtina tevdîr ên nojdariyê werbigire.

Mirov dikare wê hindê biçesipîne, kîjan beş di tewkîlê de, xal bi xal pêdivî ye bête berhevkirinê. Dako ev jî di dem ên awarte de li ber dest be, gelekî baş dibe, berdewam kartê, ya mirov ên tekîldar û tewkîlbar destnîşan bike, bi we re be. Ji bo wê pêdiviye mirovê tewkîldar Tewkîlnamê bide dest an jî wî agahdar bike, ka li kû hatiye parastin. Ev Tewkîlname ji bo sedemên çesipandinê pêdiviye, her dem bi nivîskî be. Ji ber bo biryarwergirtin ên giring in, loma pêdiviye mirovekî bi tenê bête destînîşankirinê, yê baweriya tewkîldar pê zor tê. Ev weha ye (ne weke li nik Lênerîna berdest e, li jêr binêre) ne di bin çavdêriya dadgehekê de ye

## Lênerîna berdest („Betreuungsverfügung “) çi ye?

Nêzîkî tewkîlnameya xizmetê ye dikare jî di ko Lênerîna berdest jê re tête gotin, mirovek destnîşan bibe, ew mirovê di dema pêwîstbûnê de di rêka dadgehê re (Dadgeha

lênerînê „Guhdanê“) weke lênerînerekî fermî bête vexwendinê.

Eger hat ji destpêka nexweşiyeke giran tu wekaltname, bo mirovekî destnîşankirî nehatibe danê, hinga dikare di rêka dadgeha lênerînê yekî lênerîner bête destnîşankirin, ew yê ji bo yek an jî hemî beş ên jiyanê yên giring (di bin çavdêriya dadgehê de) dikare nûnertiyê di wergirtina biryaran de bike.

Lênerîner dikar in mirov ên ji kes û kar ên wî an jî biyanî bin. Ew dikar in lênerîner ên xwebexiş bin an jî yê ji wan re tête gotinê lênerînerê pîşeyî bin. Li vir jî, li hemî biryardanan daxwaz û îradeya indîvîduel biryarder e. Rêkxiraw ên xwecihî yên lênerînê, şêwr ên ji bo lênerîna berdest pêşkêş dikin.

**Navenda tomarkirina Xizmetê („Zentrales Vorsorgeregister“)**

*Li nik navenda tomarkirina xizmetê, hucra Elmanî ya notariyal mirov dikare Qewêtînameya yê nexweş, tewkîlnameya xizmetê û lênerîna berdest qeyd bike. Erêniya qeydkirinekê ev e, ko di rewş ên aloz de, dikare bi lezgînî bête şirovekirin, aya ev tewkîlname an jî liberdestî liberdest e (binêr „agahiyên zêdetir û navîşan ên giring“, r 14) .*

## Kî dikare xatirxwestin, şînî û veşartin bi rêk bixe? Çi pêdivî ye li ber çavan bête girtin?

Mirovek mir, giringiya wî ji bo kesûkarê wî çend e, bi hêmînî û bi keramet xatir jê bixwazin û her yek bikaribe li gor xwe şînê bikêşe. Ew Tekiya muhtacan- û guhlêdangeha dilovan hayedarî werdigire û bizavê dike li derfetan bigere, hemî hêviyan pêk bîne û bikaribe piştgiriya hemî mirov ên têkildar bike.

Tekiya muhtacan ya hundurîn gelek caran digelbûnerekî şînê pêşniyar dike. Zorbeyî caran cihê heye (ji hêla olî ve bêlayane hatiye rêkxistin), ji bo her yek wek hêvî û daxwaz ên miriyê xwe û malbatê bikaribin xatir bixwazin û şînê-û tîtal ên veşartinê pêk bînin. Îro roj, gelek nexweşxane û kampên xizmet û guhdanê van derfetan pêşkêş dikin. Di dem ên guncayî de û di dema wê de xwe agahdar bikin û berwext daxwazên xwe bînin zimên, dako karmend ên wan xwe baş amade bikin.

Li Elmaniya, divêt her mirovêt ko dimire, bête veşartin. Veşartin li hemî Elmaniya ge-

rek e bi zûtirîn dem piştî çespandina mirina mirov î bi 48 demjimêran li dar bikeve û pêk were, Ji bo veşartina laşî beriya dema hatî danînê. Pêdivî bi belêkiriniek e taybet heye û pêdivî şert û merc ên taybet in. Li gor xêz ên yasayî yên hatine danîne pişkinîna yê mirî ji hêla bijîjkî ve (Tesbîkirina mirin û sedem ên mirin) diyar bibe êdî xizmeta mirî dest pê dike, wate şuştin û kefenkirin di rêka karmend ên xizmetê an jî yê miriyan vedişêrin re ye. Piştî lihevkirinekê û di bin merc û yasayên berwext destnîşankirî de, xwediyên mirî dikarin di veşartinê de alîkar bin an jî bi barê wê rabin, eger ew bixwazin, dibe ko ji ber sedem ên olî bin, serederiyeke cuda di gel term î bikin û/an jî desthingivtina termî ji hêla mirovekî din ve, ko ji bawerî û oleke din be, bibe cihê kêşeyekê.

Bi giştî, li Elmaniya derfet heye jî, yê mirî bi axaftin di gel firmeke binaxkirinê wî bibin malê û li wir kefen bikin û bixin tabûtê. Di pey re pêdivî ye term bo terimxanê bête birinê.

Li eyaleta Bayern xistina terim nav tabûtê de mecbûrî ye, wate veşartin mecbûriye ko bi tabût be. Gelek firm ên veşartinê bo veşartina miriyan li gor daxwaz û tîtalên welat ên mirî jê hatî xwe pisporkirine, dako wan li wir veşêrin. Li nik goristanên xiristiyanan, di wê navberê de, cih ên veşartinê ji bo miriyên xwedan baweriyên olî yên din jî çêbûne.

Bo hemî pirs ên bi veşartinê ve girêdayî saziyên veşartina miriyan yên xwecihî amade ne bo şêwirdanê.

# Agahiyên zêdetir û navnîşan ên giring:

**Bayerisches Staatsministerium für Gesundheit und Pflege**
Haidenauplatz 1
81667 München
www.stmgp.bayern.de
*Wezareta Welatê Bayern ji bo Tendurustî û lênêrînêli ser malper ên xwe yên Internet agahiyên berfereh li dor karê muhtacan heye (www.stmgp.bayern.de/hospiz/) û nojdariya guhlêdangeha dilovan (www.stmgp.byern.de/pallativmedizin/) û li wir agahiyên zêdetir û adrês bo têkiliyan û Iderfetên nûçe.*

**Bayerisches Staatsministerium der Justiz**
Prielmayerstraße 7
80335 München
www.justiz.bayern.de
*Ew berhevoka ji hêla wezareta welat ya dadmendî û di rêka weşanxaneya C. H Beck de hate weşand „xizmeta rûdanan, nexweşî û temen" (Li Internet bêpere ji vê malperê www.bestellen.bayern.de daxin û ji firoşgeh pirtûkxane niha (2016) bi nirxekî 5,50 € werbigirin) ew dikare agahiyan bi ferehî li ser pirs ên yasayî bo nexweşan, xizmeta wekaletê û lênêrînan bide.*

**Bayerischer Hospiz- und Palliativverband (BHPV e. V.)**
Innere Regensburger Straße 13
84034 Landshut
Tel.: 0871 9750730
Fax: 0871 9750742
E-Mail: info@bhpv.de
www.bhpv.de
*BHPV ya fermî metiryal ên agahî bi ferehî amade dike û „Rênîşandera muhtacan-û guhlêdangeha dilovan" diweşîne, ya bêpere dikare bête xwestin an jî ji malpera Internet bête daxistin. (www.bhpv,de/wegweiser). Jibilî ko agahiyên baş diyar in, navnîşan ên saziyên xizmetguzariyê jî.*

**Bayerische Stiftung Hospiz**
Hegelstraße 2
95447 Bayreuth
Tel.: 0921 6053350
Fax: 0921 6053902
E-Mail: hospiz@zbfs.bayern.de
www.bayerische-stiftung-hospiz.de
*Saziya xêrxwazî agahî bi taybet bo karê muhtacan û piştgirî çalakiyên xwebexşan yên di gel muhtacan li Bayern.*

**Deutsche Gesellschaft für Palliativmedizin e.V.**
Aachener Str. 5
10713 Berlin
Tel.: 030 30101000
Fax: 030 301010016
E-Mail: dgp@dgpalliativmedizin.de
www.dgpalliativmedizin.de
*Civata Elmanî ji bo nojdariya guhlêdangeha dilovan ya fermî e. V. agahiyan dormedorî babeta xizmetkirina guhlêdangeha dilovan. Li dor Plattforma ji hêla Civata Elmanî ve hatibû danîn, dikare bi armanc li pêşniyar ên xizmetê li nêzîkî cihê nexweş bigere.(www.wegweiser-hospiz-palliativmedizin.de).*

**Bestatterverband Bayern e.V.**
Nymphenburger Straße 118
80636 München
Tel.: 089 12664550
Fax: 089 12664551
E-Mail: geschaeftsstelle@bestatterverband-bayern.de
www.bestatterverband-bayern.de
*Hevbendiya bixakspartinê li Bayern agahiyan li ser hemî pirs ên giring li dor bixakveşartin û xizmeta bixakspartinê dide.*

**Zentrales Vorsorgeregister der Bundesnotarkammer**
Körperschaft des öffentlichen Rechts –
Zentrales Vorsorgeregister
Postfach 08 01 51
10001 Berlin
Servicetelefon: 0800 35 50 500 (bêpere)
Du–pên: 7:00 d. j ta 17:00 d. j
în: 7:00 ta 13:00 d. j
Qeyda bi rêka Online di bin:
www.vorsorgeregister.de
*Qayda navendî yên temîniyên nexweşan, wekalet û çavdêriya ferman ên berdewam.*

## Sapsî

Em spasiyên xwe pêşkêşî van pirsporan dikin, yê bi zanîna xwe ya pisporî bûn sedema derketina vê berhevokê:

**Wergerê vê pitûkoka rêber bo van ziman ev mirov berpirsiyariya wê hildigirin:**

Dr. Abdul Nasser Al-Masri (erebî)

Elena Goerzen (Rûsî)

Tangazar Khasho (Kurdî-kurmancî)

Dr. Nezîh Pala (Turkî)

Mîloş Petkoviç (sirbokirwatî)

Matthias Wentzlaff-Eggebert (engilîzî)

Teresa Willenborg (polonî)

via text-Übersetzernetzwerk:
Dimiter Traptschev (bulgarî),
Cristian Bălănescu (Rumanî)

**Dr. med. Elisabeth Albrecht**
Rêvebirê taxim PALLIAMO Regensburg SAPV

**Prof. Dr. med. Claudia Bausewein PhD MSc**
Rêvebirê Klinik û Poliklinik ji bo nojdariya guhlêdangeha Klinikum Zanîngeha München

**Dr. med. Johannes Bükki**
Rêvbirê bijîjkan
SAPV-taxim ê xizmetguzariyên  tekiya muhtacan DaSein e.V. München

**Dr. med. Winfried Gahbler**
Bencelog, şareza û nojdariya kesên li ber mirinê, şareza û Pispor di biwarê therapiya êşê, Aachen

**Dr. Roland Hanke**
serkêşê bijîjkan, Taximê xizmeta-guhlêdanghê ya Fürth

**Wilfried Krames**
Rêvebirê encumana wezareta bilind
Wezareta welatê Bayern û ya Dadê

**Dr. Erich Rösch**
Rêvebirê muhtacên Bayer– û hevpeymaniya guhlêdangehê (BHPB), Landshut

**Ali Türk**
Rêvebir, Dipl. zanistê civakî, çavdêrê peymangeha ji bo lênerîna transkulturell (Saziya lênerîn) e.V.

**Prof. Dr. Maria Wasner**
Weqfa Xêrxwaziya katolîkan ya dibistana bilind li München û cihê Koordinasiyona nojdariya zarokên li ber mirinê li Kilînîka Zanokoya München.

## Di vê Rênîşanderê de hun bersiva van pirsan dibînin:

- Tekiya muhtacan- û guhlêdgeha dilovan çi ye?
- Çi xizmet li Bayern tên pêşkêşkirin û çi karî dikin?
- Çi mesref li ser Sîgorta dikevin?
- Mafê min wek nexweş çi heye û kî dikare biryarê li şûna min werbigire, eger ez bi xwe nema bikaribim?
- Qewêtînameya nivîskî çi ye („Patientenverfügung“)?
- Tewkîlname xizmetê çi ye („Vorsorgevollmacht“)?
- Lênerîna berdest çi ye („Betreuungsverfügung”)?
- Çawa dikarim xatirxwestinê bixwazim, şînê û veşartinê bikim? Pêdiviye hay ji çi hebim?

Ev pitûkoka rêber di rêya hate dan: